

# NEWROZ



Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 127)* *Sal 21* *Reşmeh 2017 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


# Paşeroj a Gelê Kurd e

**Desteya sernivîser**



Berê, rêxistina teror bi têvedan û tedbîra destlata Tirkiyê deverên Kurdan dikirin armanca hovîtiya xwe, dixwastin wan wêran û dagîr bikin, û tiştekî bi navê "gelê Kurd û doza kurdî" li Sûryê ji meydanê rakin. Ew mebest ji berê û paşê de û niha jî armanca dewleta Sûryê, Tirkiyê û hemî nijadperest û şovenîstan Ereb û Tirk bû. Hêriş û hovîtiya terorîstan ku li ser Kobanê û Serêkaniyê pêk hatin, di çarçewa wan helwest û nêrîn de rabûn û hatin birêvebirin.

Lê, piştî berevaniya serkeftî ya hêzên kurdî li Kobanê, Girê Sipî û deverên kurdî yên din jî, û dûrkirina hêzên terorê ji derdora piraniya herêmên kurdî, niha Tirkiyê neçar bûye ku bi xwe destê xwe dirêj bike û bi kar û kiryarên têror û nemirovane li dijî gelê Kurd rabe. Herkes dibîne, ku çawa navçeyên sûryê yên bersînorî, nemaze herêmên Kurdan, bi şêweyekî ........ 

2

# PÎROZBAHÎ

Bi helkeftina hatina Cejna NEWROZê, cejina netewî ya gelê Kurd, bi navê desteya sernivîser a rojnameya NEWROZê, em gelê Kurd û hemû gelên cîhanê pîroz dikin, û hêvîdar in ku armancên gelê me ji bo aştî, azadî û wekheviyê bi cih bibin.





## Li Qamişlo Ahenga Roja Cîhanî ya Zimanê Dê Hate Lidarxistin

Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî, Radyoya Welat FM û Desteya Zimanê Kurdî ya Partiya Pêşverû, roja cîhanî ya Zimanê dê bi rengekî hevbeş li bajarê Qamişlo di Hola Kongiran de vejandin. Di destpêkê de, her du mamosteyan Sûzan û Si,ûd, bixêrhatina hemî mêvanan kirin û ev roj li wan pîroz kirin, û piştî demek bê deng û sirûda netewî, Gotina S.F.P.Z.K ji hêla mamoste Gurgîn ve hate xwendin. Di naveroka wê de, bûneya vê roja cîhanî û giringiya zimên û daxwaziya rojek teybet bi Zimanê Kurdî hat kirin. Gotina Radyoya Welat jî ji hêla rêvebirê wê ve Dilşad Xalid hat xwendin, got: Di parastina .....

6

# Hevpeyvîneke Giring Bi Sekretêrê Partiya Me Heval Mihidîn Şêx Allî re

*Li roja 28/2/2017an, acansa Qasion a Sûrî ya Nûçeyan hevpeyvînek bi sekretêrê giştî yê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûryê (Yekîtî) rêzdar Mihidîn Şêx Allî re kir, ji ber girîngiya wê sebaret rewşa Sûrî û ya Kurdan, me pêwîst dît wê wegerînin kurdî û di weşana Newroz de belav bikin.*



***-Mamoste Allî, bi nêrîna we, civînên Cinêvê wê di warê çareserkirina siyasî de li Sûryê bibe firkeke giring?***

Berî vê bi salekê min got, ku civînên Cinêvê di xelekeke vala de digerin. Ew civînine maratonî ne. Pir dijwar e, ku mera bi birdarî حزم kanibe bêje ku civînê Cinêvê wê rê li ber nexşeyeke berçav vekin, û berve aştî û hêminiyê li Sûryê biçe.

Gera çarem ji civînên Cinêvê, li ser ratma وتيرة ايقاع guhertinên li meydana hundirê Sûryê digerin, vegerandina sazûman ji bajarê Helebê re û derbasbûna Tirkiyê li Cerablusê û berve Babê li dar dikeve. Dîmena navdewletî û herêmî jî destnîşan dike, ku roja îro giringî ji şerê li dijî El Nusra û DAIŞê re ye, rikberiyê jî ji hev dikeve, û bêsûdiya paldana li ser aliyên derve jî tê nasîn.

Ev hêmanên han rêdidin em bêjin, ku Cinêv4, neynikeke ne zelal e di şerê di Sûryê de û li ser wê dibe, û ta nêzîkbûna rêvebirya Emerîkî ya nû diyar dibin, û çawa wê bi pirsa Sûrî re bide û bistîne, û atsa lihevkirinê wê bi Yektiya Rûsiya re zelal nebin, wê bê encam be.

***-Li gora nêrîna cenabê we, ma aliyên keftleftê ji bo çareseriyeke giştî li Sûryê dilsoz in? Lê ew dirêjkirineke ji her du aliyan de?***

Rijîm ketiye rewşeke pozbilindiyê, aliyên din ji keftleftê jî, ango Desteya Bilind a Gufûgoyan û tîmên leşkerî, ew jî bi şorên hin paytextên herêmî ve girêdayî ne, ewên ku xema wan a bingehîn siyaset ……..❸

---

## Paşeroj a … Dûmahîk

rojana dikevin ber hêrişên leşkerên Tirk. Ew mirovên sivîl dikujin, gund û arziyan wêran dikin û jiyana mirovê Kurd dixin metirsiyê û dijwartir dikin.

Wek em dibînin, di van çend salan de, bi sedan kesên sivîl bi destên serbazên Tirk têne kuştin, bi sed hêktaran zevî têne desteserkirin û wêrankirin, bi deh hezaran darên zêtûnê û darên daristanan têne birîn û hilkirin û xeta sînor jî bi dîwarên bêton û hêsin tê dorpêçkirin.

Bêguman, armanca dewleta Tirk ji van kiryarên hov û çepel ew e, ne teror û rêbirîna wê ye, armanc û mebesta wê ya serke û bingehîn ew e, ku deverên kurdî li Sûryê dorpêçtir bike, wan wêran bike, xelkê wê jê derxe, û ji doza wî dilsar bike, da ku dev ji mafên xwe yên netewî berde. Ew bi her awakî hewil dide ku rewşa Rêvebirya Xweser kambax bike, dilê xelkê jê sar bike û wê têk bibe.

Dewleta Tirk pêkol dike, ku di bin bandora wan seng û guvaşên rojane û hovane de li ser gel û welatê me, xelkê neçar bibe, yan dest ji warên bav û bapîrên xwe berdide, welat vala bibe; yan jî xwe radest û qayîl bibe têkeve nava pêlanên gemar û şerxwazan li Bakurê Sûryê, û bibe destik ji Tirkiyê û hêzên alîgirên wê re.

Li hembera van pêlan û zordariya dewleta Tirk û hêzên terorîst ku ew ji xwe re dan û tîmar dike, li ser gel û her mirovekî Kurd û hemî hêzên kurdan sepan e, ku xwe bikin yek, bi xaka xwe ve werin girêdan, û ta ji wan were, di ber hebûn û azadiya xwe de berevanbiyê bikin, pêdar bin, hîç dudilî nebin û bê rawestan xebata xwe berdewan bikin. Roja îro, hemî rewş, nîr û mercên herêmî û navdewletî jî xuya dikin, ku mafdariya gelê Kurd û nemafdariya neyarên wî ji gelên cîhanê û raya giştî re jî baş xuya bûye û hatiye têgihîştin, û roj jî nema bi bêjinga neyaran tê girtin (veşartin)! Ango, em kanin bê dudilî bêjin: Paşeroj ya gelê Kurd e.

## Hevpeyvîneke ... Dûmahîk

û rewşên wan ên taybet in, û guhdaneke guncav bi rewşa bobelatî ya sûriyan û paşeroja welatê wan nakin. Lewre, ew rewşa guftûgoyên di navbera her



du aliyan de girêf dikin.

***-Digel peyman hene, û agirbest jî heye, lê dîsa jî sazûmana sûrî bajarên ku di bin destê rikberiyê de ne bombebaran dike, aya ew nîşana nakirina çareseriya siyasî ye?***

Li destpêkê dixwazim dupat bikim, ku hêrişa li ser sivîlan, yan ew mîna mertalên mirovî werin bikaranîn ji binî de ciyê şermezariyê ne. Pirsgirêka dîrokî û kevnar li welatê me Sûryê heye, ew e, ku ji zû de siyasetên rijîm û stubariyên saziyên dewletê bi xurtî têkelîhev bûne, û dikin ku sazî di karên xwe ne serbixwe bin. Erê! Çareseriya siyasî ji hemî suriyan re rêgeh û vebjara çêtir e, na belê ya ewletir û belkî tekûtenê ye jî. Me gelek caran daxwaza wê rêgehê kiriye, û berî ku li sala 2011ê qeyran hêgin bibe, û Sûrye bibe yarîgeh ji gelek dewletên cîhanê re û teror û toreyên “cihada selefî” tê de gol vedin, me doza wê dikir.

***-Win amadebûna Encûmena Niştimanî ya Kurdî di nava Itîlafê de li civîna Cinêvê çawa dinirxînin?***

Her şandeyek Itîlafê serok, şêweyeke kar û pirotokoleke wê heye. Eger endamên şandeyê ji çi rengî û çi alî bin, ciyê dudengiyê yan rikberiya li ber masa guftugoyê tuneye.

***-Hewildanên we hene, ku win nêrînê aliyên kurdî berhev wînin, daku şandeyeke yekbûyî li ser bingeha mafnameke kurdî ava bikin û mafên Kurdan li Sûrya paşerojê biparêzin?***

Roleke partiya Yekîtî-El Wehdê pir naskirî, ji destpêkê û ta dawiyê, û ji dil de jî ji ber karûbarê Desteya Kurdî ya Bilind û li gora lihevkirinên Duhokê û Erbîl (1-2) hebû. Rola me di levkirina Duhokê de mazin bû. Me xwast xalên hevbeş di navbera rêza kurdî de diyar bikin, û hemî hêza xwe ji bo bergiriya li hember hêz û toreyên selefî, nemaze jî DAIŞ û El Nusra, bikin yek.

Nêrîna me, em dibêjin gelê sûrî ji du netewên sereke pêk tê. Dûr û nêzîk jî zanin ku neteweya mezin a duyem piştî Ereban li Sûryê Kurd in. Ew di sersiya dewleta Sûrî de li dirêjiya heftê salî ji hemî mafên xwe yên netewî bêpar mane. Ji bilî ku tûşî hemî rengên zor û setemê jî dibûn. Ji ber wê jî, ji mafê me ye, wek Kurdên Sûrî, navnîşan û lêvegereke me ye siyasî hebe, şandek jê peyda bibe û xwedî pirojenêrîneke siyasî yan reşbeleke kurdî be, wek we bi nav kir, û ew reşbeleka bide naskirin ku kurd li Sûryê çi dixwazin?

Li ser wê bingehê, em ji hêla xwe de, digel astengan, ku yên giring jî destên derve ne, hemî hewildanên xwe dikin daku çarçew û çalakdariyên kurdî yên sûrî bigihên hev. Pirojeya kurdî ku em dibînin ya baştir e, rêgeha siyasî ya aştiyane bo çareseriya qeyrana sûryê were vebjartin. Zimanê hevpeyvîn û guftûgoyê di bin sîwaneke navdewletî de li darkeve. Ol ji dewlet û siyasetê were birîn. Yekîtiya welêt, xak û gel, bê parastin. Zagona nevdewletî ya mafê mirovan û çi belge û peymanên ku mafên netewî û nasnameya çandeyî û zimanî yên gelê Kurd di destûrê dewletê de diparêzin were pêkanîn û bilindkirin. Lêveger li sîstema dewletê çêbibe û bibe biryar, çinkî eger mandina sîstema navendî ya dewletê bimîne, wateya wê dubarekirineke ji zordestî, nijadpersetî û jevkirina pêkhateyên gel e; lê sîstema nenavendî ya hevgirtî, kane çareyên serkeftî ji pirsên welêt re bibîne, û yekîtî û ewlehiya wî biparêze; wek nimûne, bila sîstema berevaniyê û siyaseta derve di destê navendê de bimîne.

***-Sebaert Rêvebiriya Xweser, aya win wê baş dibînin, û ew kane pêdewîstiyên pêvajoyê pêk bîne?***

Rêvebiriya Xweser li herêmên Cezîr, Kobanê û Efrînê ji aliyê parastina aştiya civakî û jiyana bi ewle gavine baş avêtin û hêrişên DAIŞ têvedan û têk birin. Bi deh hezaran mişextiyê sûrî ji navçe û parêzgehên Sûryê yên din pêşwaz kirin. Loma jî pêwîstî û mafdariya parastina wê bûye cihê lehevkirina kolana kurdî. Lê asta xebat û rindiya karê wê bi awakî din tê birin, çinkî ew di çarçewa asta ku em dixwazin de lê tê nêrîn. Çiqas şaşî, tûk û alîgirvanî di çarçew û encûmenên Rêvebiriya Xweser hebin û karkirina wê lawaz be, ew nabin eger ku em ……. 11

# Hemî dibêjin: Şerê Navxweyî Xizmeta Dijmin dike

**Merwan Berekat**

Di dîroka miletan de tiştê tewrî pîs û pirzirar şerê navxweyî ye. Şerê birakujiyê agirekî kujer e û tiştek bi navê serketinê di wî de nîne. Encama wî tenê derdana nirx, doza gel û xwînrijandin e. Ji bo çi, sedem çi be û bi çi şêweyî be şerê navxweyî û birakujiyê şerekî qirêj û nesiciyane ye, û li dawiyê lêvgezkirina poşmaniyê ye.



" Xane Sor - Şengal .... Na ji Birakujiyê re "

Dema ku dijmin û xêrnexwezên miletekî nikaribin vîn û xebata wî miletî ji bo azadî û rizgarkirina welatê xwe ko bikin, ew hewil didin di navbera hêzên wî miletî de şerekî navxweyî peyda bikin, taku ew lawaz bibin û hev tune bikin. Di vî warî de gelek nimûne di dîroka gelan de hene. Taku em pir dûr neçin, vaye rewşa Sûriyê li pêş çavan e. Di dîroka gelê Kurd a nûjen de jî gelek nimûne ji bo şerê biratiyê hene, di wan şeran de bi hezaran qurbanî hatin dandin, û li dawiyê ji bilî poşmaniyê tu encam nedan. Tucarî, nemaze li Rojhilata Navîn û Kurd jî di nav de tevgerên siyasî û yên ne siyasî bê nakokî nînin, lê rastî û hişmendî ew e, ku ew nakokiyan bi danûstandinê çareser bibin, ango ew derbasî qonaxa şerê navxweyî nebin.

Di vê demê de gelê Kurd û doza wî ya dadmed di firkine pir nazik û hestwar re derbas dibin û derfetine pir girîng û hêja lêhatine, ji ber wê jî zor pêwîst e, ku rêvebirên Kurdan ji her demekê pirtir haydar bin. Eger em bi aliyê şerê biratiyê de bişimitin, tirsa mezin ew e, ku destkeftiyên hene jî têkbiçin û li dawiyê tenê nifirên nifşan ji me re bimînin. Bila em tev zanibin û em piştguh nekin, her ku gelê Kurd nêzîkî armanca xwe ya gewre AZADIYê dibe, ewqas dijmin çavsor, dilteng û har dibin, û bi hemû hêz û kîndariya xwe li pêş Kurdan derdikevin û şerê me dikin.

Em dengê xwe bilind dikin û dibêjin: Eger şerê birakujiyê di nav Kurdan de çêbibe, bêguman ne tenê destkeftiyên ku hatine bidestxistin, lêbelê derfeta serkefitina doza kurdî jî wê were derdan. Tenê bi yekrêzî û lihevkirinê serkeftina mezin tê bidestxistin.

# Gotina kovara PIRS û weşana NEWROZ

*Di bîranîna "**Roja Cîhanî ya Zimanê Dê**" de.*

**Komîta amadekar..**


**Beşdarên bi rûmet..**

Silav û rêz bo we hemiyan...

Li destpêkê, bi kurtî be jî, pêwist e em hinekî li rûpelên dîroka nêzîk vegerin û bixwînin, da ku em bizanin bê çima ev roj bi "Roja Cîhanî ya Zimanê Dê" hatiye bi navkirin.

Berî damezrandina Komara Bengladişê, gelê Bengalî li ser xaka bav û bapîrên xwe di çarçewa dewleta Pakistanê de dijî. Di Avdara sala 1948an de, li ser navê hikûmeta navendî ya Pakistanê, di civateke gelêrî de **Mihemed Elî Cenah** ê ku fermandarê giştî yê dewletê bû, zimanê Ordî weke zimanê fermî yê tekane li seranserî welêt ragihand, bi vê yekê, wî tu rêz neda zimanê Bengalî, û rûmeta wî bi vê biryara şoven hate birîndarkirin. Li rojhilatî welêt, gelê bengal rabû ser ……...

5



# Adar, Şîn û Şahî Ye

Nazdar Hesen

Weke di dîroka Kurd û Kurdistanê de tê zanîn, meha Adarê, meha şîn û şahiyê ye, meha serhildan û serkeftinê ye, ji ber vê yekê jî, taybetmendiya wê cuda ye.

Ji ber ku ev meha bi bûyeran dewlemend e, ew hestên kurdayetiyê bi coş û hêz dike. Di milekî de rojên bi êş, xemgînî û bobelatên, ku bi ser Kurdan de hatine dibişkivin û dîmenên herî bi êş, dîmenên komkujiya **Helebçeyê** zindî dibin, ya ku di 16/ 3/1988 an de li ser destên rijêma Basê ya Îraqê, nêzî pênc hezar kurdên bêguneh, bi jehrên kîmyewî û çekên têvel hatin kuştin.Lewre, her sal di vê rojê de, gelê Kurd li seranserî Kurdistanê pênc xulekan bêdeng li ser giyanê pakrewanên vê komkujiyê radiweste. Û di milekî din de, rojên serhildana **Qamişlo** bibîr tên, ya ku di 12/3/2004 de dest pêkiribû, û piştre, li seranserî herêmên kurdî belav bûbû, û pêştgiriya vê serhildanê hatibû kirin û ji bo wê jî hejmarek qirbanî dabûn .

Lê belê, boneya herî nirxdar û pîroz, roja **21 Adarê** roja cejna **Newrozê**, cejna netewî ya gelê kurd e, destpêka sersala kurdî ye, destpêka rojeke nû û bihareke rengîn e.

Ji ber vê yekê jî, ev meha ji me Kurdan re jiyaneke nû diyar dike û serkeftinê nîşan dike. Bila Cejna Newrozê li gelê Kurd û hemî gelên cîhanî pîroz be!.



---

## Gotina kovara … Dûmahîk

piyan û dest bi serhildan û têkoşînê li dijî vê fermana sitembar kir.

Roja 21ê Sibata sala 1952an, polîsê Pakistanê, xwepêşandana ku li gastîna kolêja bijîşkiyê li zanîngeha Daka yê hatibû bi rêveçûn gulebaran kir, di encamê de, pênc çalakvan hatin kuştin û bûne cangoriyên zimanê dayikê. Di bin guvaşa xebata gel de, hikûmeta Pakistanê neçar bû ku biryara xwe biguhêre, û bi mafê zimanê Bengalî weke zimanê fermî li kêleka zimanê Ordî rûne. Û ji sala 2000î ve, li ser pêşniyara dewleta Bengladişê, rêxistina navnetewî UNESCO her sal bi rengekî fermî, roja 21ê Sibatê weke "Roja Cîhanî ya Zimanê Dê" pîroz dike.

**Xwişk û birayên rêzdar...**

Ji ber rol û bandora zimên di jiyana gelan de, neyarên gelê Kurd ên şoven û zikreş hewil dane ku zimanê wî winda bikin, bipişfin û ji holê rakin. Di vî warî de, wan karbidestan, zimanê Kurdî qedexe kirine, rê û derfetên pê xwendin û nivîsandinê li ber girtine, rê nedane vekirina dibistan û zanîngehên bi zimanê Kurdî û bi her hawî, xwestine ku wî li ber çavên keç û lawên wî reş û bê rûmet bikin, ta radeya ku zimanê Kurdî bi zimanê kovî û hovan bi nav dikirin!. Herweha dixwestin nifşê Kurdî yê nûhatî ji ber ziman û kesayetiya xwe ya netewî şerm û fihêt bike. Lê, bi saya xebat û pêdariya rewşenbîr û mezinên me yên dilsoz, pilanên wan herifîn, têkçûn, zimanê me yê şêrîn hate parastin û îro ew roj bi roj nûjen dibe û pel davêje.

Li dawiyê, û li ser navê her du weşanên me, kovara PIRS û weşana NEWROZ ên bêtir bîst salan e ku li Sûriyê bi zimanê Kurdî têne weşandin, em hemû xwendevan, rewşenbîr û nivîskarên dilsoz pîroz dikin, û hêvî dikin ku bi vî zimanê şêrîn ê bi xwîn û xwêdana mezin û lehengên me yên dîrokî hatiye parastin, ên bi saya xebata wan, gelê me xwe li ber pêlên reş ên windabûn û pişaftinê girtiye, çand û wêjeya aştî, rêzgirtin û hezkirinê bi firehî belav bikin û bila her dem pendên rewşenbîr û siyasetmedarê Kurd ê nemir **Dr.Nûredîn Zaza** li bîra me bin, û em li ber ronahiya naveroka wan tevbigerin, dema ku wî digot:

***"Gelî Kurdan!***

***Eger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin".***

Silav ji "roja zimanê dayikê" re! Û Spas ji guhdariya we re!

**Kovara PIRS û weşana NEWROZ -** 21.02.2017 Z-2628K

# Têbînî Ji Nivîskarên Newrozê re

Hin nivîskarên berêz li weşana Newrozê merc dikin, ku çawa nivsarên xwe hildidin wilo bêne weşandin. Bêguman ew mafekî rewa û bingehîn e, û daxwazeke mafdar e.

Lê li aliyê din, her weşan û alaveke ragihandinê rêgez û pirotokoleke xwe ye taybet heye li ber roniya wê dimeşe, karê xwe dike û pê pêbend dibe. Ji stubariya desteyên rêvebir û sernivîser e ku li hemî nivîsarên digihên ber destê wê vegere, wan vebjêre, ji bo weşanê li saz bixe û li dawiyê belav bike.

Sebaret nivîsandina bi zimanê kurdî, stubariya desteyên rêvebir û sernivîser bêtir û girantir dibe. Çinkî, mîna ku em zanin, nivîsandina bi zimanê kurdî hîn baş cih negirtiye û rûniniştiye, ji ber ku ew tenê ji çend dehsalan de daketiye warê alavên ragihandinê û hîn bi rengekî vehesî cih negirtiye. Piraniya pir ji nivîskarên kurdî jî ji zanîngeh û peymangehên zimanê kurdî derneçûne, ne jî li kolîcên rojnamegerî û ragihandinê xwendine. Ji bilî ku piraniya weşan û mîdiyaya kurd ji hêla partiyan ve dertên, ew jî wan dixin çarçeweke taybet ji hizr û helwestan.

Li gora tiştên jorborî, dema nivîsarek ji weşaneke kurdî re tê şandin, desteya sernivîser li ser du pergalên nivîsarê disekine, ziman û naverok. Ango gerek e nivîsar bi zimanekî durust ku xwendevan têbigihê, û naveroka wê jî li gora siyaseta weşanê be.

Di vî warî de, ji bo weşana me Newroz jî ew her du tişt li dar in û di çarçewa pirotokoleke taybet de karê xwe dike. Yek: Ew weşana partiyekî ye, ango nêrîn û siyaseteke xwe heye li ser dimeşe. Didu: Ji aliyê zimên de jî, qaserî pê zane û kane li ser rêbaza Mîr Celdet Bedirxan diçe.



NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Dr.Nûredîn Zaza 1919 - 1988

Osman Sebrî 1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar (126) Sal 21 Rêbendan 2017 z - 2628k Buha (75)L.S

## Li Sûriyê ... Hê jî şerê gemar berdewam e

**Desteya sernivîser**

Ev e nêzîkî şeş salan e ku gelê Sûriyê bi kul, derd û xem, di dojeha şerekî dijwar û gemar de dijî... Di vî şerî de, ta niha derdora 500 hezar kesî hatine kuştin, milyonek jî hatine birîndarkirin. Ji bilî rijandina xwîna gel, piştî wêrankirina dehên bajaran û kavilkirina hezarên gund û bajarokan, bêtir ji 12 milyon kesî ji cih û warên bav û bapîrên xwe bar kirine, li biyaniyê penaber bûne, di bin konên serşoriyê de ew toşî hemû reng û cûreyên bê rêzî û têkiliyên ne mirovane bûne, perşîan, xizan û bê rûmet dijîn...Ango mirov dikare bibêje ku welat ser û ber ji welatiyên xwe re bûye dojeh, bûye goristaneke mezin!..

Derbara vê bobelata giran a ku bi ser vî gelî û welatê wî de hatiye, eger bi kurtî be jî, pêwiste em bi hev re li bersiva pirsekê bigerin, ew jî ev e:

Ma gelo kî di ber vî gunehê giran û tewana mezin de berpirsiyar e?!...

Li gora belge û kiryarên li ber dest û çavan, berpirsiyarê sereke yê di ber vê bobelatê de rijêma çavsor a totalîter e, ya ku bi darê zorê, bi zêdegaviyên dezgehên

" Taxa Şêx Meqsod "

ewlehiyê, stoyê gel bada bû, ew ji hemû maf û azadiyan bê par hiştibû, hemû şêweyên girtin, lêdan û eşkencekirinê ........... 2

## Bibîranîna Nemira

Li 31.1.2017an , rêxistin Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Efrînê , bi beşdariya girûpek ji heval,û dostan, û beşdarbûna şandek ji komîta rêvebir, seredana gornên hevalên pakrewan û nemir Kemal Henan (Gundê Tilifê), Mistefa Îso (Gundê feqîra), Ebilrehman Hemadê û hevala Gulistan (Gundê Çolaqa û herweha Nemir parêzer Şewket Nesan jî kir û nemirên azadiyê bi bîr anîn.

Li ser gora hevalê me yê nemir Kemal Henan, .......... 5

## Dîrok û sernavên gundekî... Gûndê "Elî bedranê".

Navê gund Elî Bedran e, ji ber ku pîrozgehên du şêxên ku birayên hev bûn (Elî û Bedran) li vî gundî ne pê bi nav bûye. Di vê dawiyê de tîreya (ta'ifa) Elewî ev herdû zîyaretgeh bi xwe girtin, û nîşan dikin ku giwah û belgeyên dîrokî di dest wan de hene ku ev her du ziyaretgeh li tîreya Elewî vedgerin, û di projeya guhertina navên gundan ji hêla hikûmeta Sûriyê ve di sala 2003 an de navê gund kirne (Bedir). .... 6

Loma jî, gava ku hin guhertinên biçûk ji aliyê rastnivîsê de di gotarekê de çêbûn, yan hin gotinên gizreyî ku belkî şaş werin têgihîştin di hin gotaran de hatin guhertin, em hêvîdar in nivîskar rê bide, li xatirê xwe nebe û wek mafekî rewa ji desteya sernivîser re bibîne.

***Sernivîseriya weşna Newroz.***

---

## Li Qamişlo ... Dûmahîk



**/ Wêne ji rûpela Bûyer /**

zimên de, rola raghandinê pir giring e. Di peyre mamoste Faris Osman gotina Desteya Zimanê Kurdî ya Partiya Pêşverû xwend, û li ser rola partiyên Kurdî û pêşrewên Zimanê Kurdî di parastina zimanê Kurdî de axivî. Û hunermend Se,id Ferso çend stranên xweş diyarî mêvanan kir. Hêjayê gotinê ye ku di vê helkeftê de helbestvanê Kurd Ferhadê Ecmo ji hêla hersê saziyên navborî ve hat xelat kirin. Lê mixabin ji ber rewşa wî ya tendurstî, ew nikarîbû beşdar biba. Piştre mamoste Ednan Silêman gotina Rexistina Mafên Mirovan li Sûriyê -MAF xwend, û li ser raghandina cîhanî ya mafên mirovan, hevpeymanên navdewletî û rêzgirtina wan ji Zimanê zikmakî re axivî, û her wiha giringiya vê rojê ji bo gelê Kurd û zimanê wî diyar kir. Piştre, gotina kovara Pirs û weşana Newroz ji hêla mamoste Newafê Bişar ve hate xendin. Helbestvan Xalid Omer du helbstên xwe yên xweş diyarî beşdaran kirin. Piştre fêrname li şagirtên biserketî yên S.F.P.Z.K hatin belav kirin. Li dawiyê, hunermendê deng û awazxweş Beha Şêxo, berî dest bi çend stranan û awazên xwe yên xweş bike, spasiya komîta amadekar kir û li ser rola hunermendan got: Ez bi hêvî me ku me jî dilopek ji ava derya vî Zimanî parastibe.

# Çalakiyên S.F.P.Z.K

## Ji çalakiyên Saziya Fêrkirin Û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê (S.F.P.Z.K)

### Şaxê Cizîrê



Komîta Rewşen di 13‘ê Rêbendana (Çile) 2017an de çalakiya derçûna xuleyeke Alfebêya zimanê kurdî li navenda "Isma`îl Umer" ya PYDKS li bajarê Dirbêsiyê li darxist , di çalakiya derçûna xuleyê de 13 şagirt fêrnameyên Abeya zimanê Kurdî wergirtin .

Mamosteya xuleyê XEDÎCE OSMAN di destpêka çalakiyê de gotinek derbarê giringiya hînbûna zimanê dayikê û daxwaza berdewamiyê di hînbûna astên pêştir de kir.

Li dawiya çalakiyê, Komîta Rewşen pirtûkên zimanê kurdî weke diyarî li şagirtan belav kir. Ji aliyê xwe ve malbatên şagirtan jî kêfxweşiya xwe anîn ziman û spasiya komîta Rewşen kirin.

### Şaxê Efrînê

Li roja 17/2/2017an, komîta giştî ya navça Efrînê Ya Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî, civîna xwe ya salan e li dar xist, rewşa kar û xebata mamostan, komîtên deveran û navçê danî ber destê mamosteyên xwe. Civîna fere çend pêşniyarên sereke pejirandin û biryar da ku li ser wan bixebite:

Lidaexistina semînarên taybet ji bo gengeşkirina pirsgirêkên rênivîs û rêzmanê ku hîn di zimanê kurdî de çareser nebûn.

Ji bo bilindkirina astên berhemên kurdî yên ku dê werin çapkirin, biryar ew bû, ku civînên taybet ji bo lêveger û nirxandina wan berheman berdewam bibin.

Li her gundekî ku mamosteyên saziyê lê hene, mamoste hewilde ku malek ji bo fêrkirina zimên û belavkirina pirtûkên kurdî were vekirin û li ser navê wî gundî were binavkirin, daku bibe mîna “Navendeke Çandeyî”, ziman tê de were fêrkirin, û pirtûkên kurdî werin belavkirin.

### Komîta Meydankê-Efrîn

Li roja 26-1-2017an, komeke ji 22 şagirtina korsa zimanê kurdî ya asta yekê(ABe) bi serkeftî derbas kirin û fêrnameyên xwe wergirtin. Li wê boneyê mamosteyê korsê Sedela li ser giringiya zanîna xwendin û nivîsandina zimanê kurdî axivî, hemî şagirt spas kirin, sê şagirt ji nava wan xelat kirin û fêrnameyên şargitên serkeftî jî li wan belavkirin.

# Rêxistian Partiya PYDKS li Dewleta Nerwêcê

Di bin silogana "Yekîtiya rêza kurdan " de, li bajarê Stevengerê kongira damezrandionê ya Saxê Nerwêc a Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûryê li dar ket û ronahî dît.

Hevalên kongirê berdewamiya piştgirya gelê kurd li hundirî welêt daxwaz kirin; wan pêdariya gelê me yê li Efrînê, kobanê û Qamîlo li ser axa welatê li hember hêzên rûreş bilind nirxandin. Hevalan girîng dîtin ku partiya me li Awrupa rola xwe baş bilîze û çand û tora kurdî bi xelkên Awrupa bide nasîn. Li dawiyê rêvebir û endamên şaxa Nerwêc û yên kongirê rêxistina Awropa jî bi şêweyekî demokratî hatin hilbijartin.



# Law û dotên Kurdan li Almanya

**Dr. Muhamed Zeyno**

Di van du - sê salên dawî de, bi sedan malbatên Kurdan koçî welatê Almanya bûn. Malbat bi hemû endamên xwe ve, bav, dê, hûr û gir berê xwe dan vî welatî . Helbet sedema koçberiyê heye, ew jî şerê gemar û qirêj e ku ev bêtirî pênc salaye de li Sûriyê didome. Gel rastî gelek astengiyan bû. Yek ji wan astengiyan dêmek girtin û kavilkirina dibîstanan bû. Bi sedan belê bi hezaran avahiyên dibîstanan bûn armanca tank û topên her du aliyên şer, aliyê rijîma Sûriyê û rikberiya wê. Her weha riya çûn û hatinê bo bajaran hatin birîn, êdî riya zango û dibîstanên bilind girtin û bi hezaran xwendevan neçar man xwendinê rawestînin .

Ji ber vê bobelat û qeyranê hin kesan riya koça Almanya wek çareseriyekê bo zarokên xwe dîtin û bi zehmetiyeke pir dijwar xwe gihandin vî welatî.

Diyar e heger em pirsê ji kê bikin, gelo bo çi hûn hatine Almanya? Bersiv wê ev be, ji bo xwendina zarokên xwe em hatine vir. Belê bi hezaran law û keçên me her roj berê xwe didin dibistan û xwendigehan û vedigerin malên xwe. Li gor şopandin û lêkolînên min; tevî ku hîn zû ye em encameke zanistî diyar bikin, pirê wan şagirt û xwendevanan di xwendina xwe de ne serkeftî ne. Heger hin şagirt hebin zîrek û jîr bin, lê ew hejmar pir kêm e. Gelo çawa xortekî 15 - 16 salî û piştî du - sê salan xwendin, hêjî nikane bi serbestî waneyên xwe bi qedîne?. Bi ya min be, sedema vê qels û şûnmayînê gelek in, lê girseya wan vedigere hin faktoran:

1 - Ne aramiya li welêt bandoreke pir berdide ser raman û jiyana nifşê me li Almanya.

2 - Dê – bav, ji ber astengiyên zanîna zimanê almanî, nikanin ji bo zarokan bibin alîkar .

3 - Astengiyên zanîn û fêrbûna zimên ji bo zarokan bi xwe.

4 - Ramana vegerê bo welêt, madam emê vegerin, ji bo çi xwendin?.

5 - Karmend û mamosteyên dibîstanan li xwendina şagirtan xwedî dernakevin, ew tên waneya xwe didin, şagirt fêr bû an na, ne ewqas girînge bo wan.



Li vir kontirol û çavdêriya mamostan tuneye, divê şagirt bi xwe li xwe Miqate be. Dema zarok vedigere mal; bav an jî dê pirsa waneyan dike. Çawa bû dersa te lawê/keça min?. - Baş e bavo. Te waneya xwe çêkir ?. - Erê bavo min li dibîstanê çêkir. Paşê bav bi arîşe û pirsên Kurd û Kurdistanê mijûl dibe û zarok bi bernamên televizyonê ve mijûl dibe.!!!!!! Her yek di jiyana xwe de dijî. Em kanin bêjin ku ew armanca ku dê û bavan danî bû ber xwe û ji bo pêkanîna wê berê xwe dan Ewropa/Almanya bi gavên pir giran bi rê ve diçe.

---


Ji navdarên Kurd

# Xalidê Neqişbendî Şehrezorî Yê Kurd

Rêola Neqişbendî li ser destê Şêx Xalidê Şehrezorî (1779-1826) derbas Rojhilata Navîn bû. Şêx Xalid ji Kurdên Silêmaniyê, ji Hoza Caf ji Kurdistana Îraqê ye.

**Xalidê Şehrezorî** li ber destê bavê xwe û zanyarên Kurdistanê fêr bûye. Pişt re, ji bo xwendina xwe sergihayî bike, diçe bajarê Senendecê li Rojhilata Kurdistanê. Paşê vedigere Silêmaniyê, û demekê karê fêrkirin û amojkirinê dike.

Li sala 1804an diçe seredana Hecê, lê ew demekê ............ ⓫




# Nemir Dr.Nûriddîn Zaza..!

Nûrîdîn Zaza mirovê Kurd ê hêja û payebilind, mirovê Akadêmîk û siyasetmedarê asteberz, li sala 1958an tevlî refên Partiye Demokrat a Kurd li Sûriyê bû bûbû, mirov ji bo zimanê kurdî xemxwar, digot: “Kurdino! Eger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin”.

Gorbuhiştê nemir, li roja 15 Reşemeha sala 1919an ji dayîk bû û li roja 7/10/1988an çû ser qedera xwe. Li boneya roja jidayîkbûna wî, emê gotin û nêrevaniya kebaniya nemir û rojnamevan û nivîskara Siwêsrî ya navdar, xanim Cêlbêrt Zaza ku li 31/1/2017an belav kiribû biweşînin. *(werger ji Erebî).*

((Min Nûriddîn li sala 1971an li Siwêsra di riya hevala xwe endama desteya sernivîser a kovara “Le Îlostir” û parêzer “Cêlbêr Baştold” re ku rawêjkarê niştimanî b[ li Siwêsra, naskir.

Dema ku Nûrîdîn bi egera damezrandin Partiya Demokratî Kurdî li Sûryê hat girtin û êş lê



hat kirin, Cêlbêr xwast berevaniya wî bike, bareyek medyayî ji bo berdana wî li Siwêsra rakir, û ta roja mirina wî 1988an ew bi hev re dost [ hevjîn bûn.

Ez di jiyana xwe de pêrgî kesekî destpak mîna Nûrîdîn nehatim. Ew mirovekî mînakvan bû, ji bo ku gelê Kurd mafên xwe yên sereke bi dest bixe dixebitî , wî hîn ji zaroktiya xwe de berevanî ji ber doza kurdî de dikir. Min li sala 1971ê hevalekî Nûrîdîn li Bêrûtê dît, wî ji min re got, wî xelkê Kurd li Şamê bi dizî fêre xwendin û nivîsandina kurdî dikir.

Hêvî û xewna Nûrîdîn ew bû, ku Rojhilateke Navîn li ser mûdêla Siwêsrî bibîne, di nava wê de, hemî ziman, çand û ol bi hev re bijîn, Rojhilateke Navîn de, ku hemî milet bi heman mafan bin.

Nûrîdîn li gora dema xwe, û li gora asta xwendina xwe ji kesên derdora xwe zanatir bû. Ew mirovekî nimûne bû, rojekê nepejirand ku kesek wî bikire, û xwe nefrote kesekî jî. Ez bi xwe nêrevan bûm ku çawa wî daxwazên hevkariya bi peran ji hêla Yûnaniyan li dijî Tirkiyê, û ji Îraqiyan li dijî Sûryê nepejirand, û weha ji Yekîtiya Sûvyêtê de jî. Ew mîna bilî xwe ne siyastmedarekî keysebaz bû, wî vir, dizî û komkirina peran nizanî.

Nûrîdîn li Siwêsra, ji aliyê diravî de, jiyanek dijwar dijiya û xizan jî mir. Nûrîdîn bav, hevjînekî dilsoz û rewşenbîr bû. Wî dilreşî û neyartî nizanî. Ew mirovekî sicîpak î sergihayî bû.


Ji min re ne giring e ku hinek Kurdên Sûryê ew ji bîr kirine, yan jî naxwazin li rola wî di damezrandina yekemîn partiya kurdî de li Sûryê mikur werin. Çinkî tiştê ku wî kir naskirî ye. Hin Kurdan zanîn çawa bibin xwedî milyonan, lê ew ne ji pergala Nûrîdîn bû, li wan pîroz be. Penda çînî dibêje: “Berîkên kefen tunene”! )).

***Cêlbêrt Fafir Zaza.. 31/1/2017. Wergêr: M.Elî.***

---

## LÊBORÎN

Di hejmara126an de, bi şaşîtî sernivîsa gotara nivîskar Nûşîn Bêcirmanî hatiye guhertin. Ji şûna (Diyaloga Kurdî -Kurdî li rojavayê Kurdistanê), (Girêka Kar û Kurdî-Kurdî) hatiye nivîsandin. Bi navê desteya sernivîser a Rojnameya NEWROZê, em lêbûrînê ji nivîskar dixwazin.



# MORÎKA ŞÎN

**Merwa Brîm**

Dem ber bi êvarê bû, mast di beroşa esîmên de raqetî û di koşa tariyê de rijî , zeviyên gênim bawîşk vedan û di tanişta riya axî de hilketin. Pêşnimêjê gund di megrefona mizgetê de kuxî û kolan ji xulmaşiyê veciniqîn.. Çepikên şimikên zarokan guhên dìwaran har kirin. Wê êvarê wek her car bejna dayîka min di ber cobela xênî re xuya bû û bang li me kir: Êdî bes e kirasê êvarê mor bûye werin mal.. Tev birayên xwe me dengê dayîkê şopand û riya paporê di paşela qerebalixê û lîstoka qîlê de hişt, hema stiwê min li paş bû çavên min jî gilç dipan, dê di ku de bi cî bibe..?.



Di êşikê de dayîka min teşta baqirî tijî av kir û dest çavên me şuştin, mîna qelfek varik di pînika şevê de em guhdarî bêdengiyê bûn, meqesokan bi çîvçîvê çîtê wè bêdengiyê nikilandin, ji dîrakekên bana xênî re çîrokên geşta BAŞÛR xwendin. Palgehê kepekî vala bû ji şûn enîşkên bavê min. Wê şevê hundir lal bû ji gev û azarên wî. Ber bi rojava rodankê di qulikên êlekê re aso dipa, çawa dûvê xwe yê zîvî leqand û tevinê nîsanê tevizand, zimanên êgir di hinavên sobê de li hev geriyan, wê hîngê dayîka min di ber rodankê re derbas bû, ji nişke ve dest danî ser dêv û bi tirs got: Ooooo....! Ev du marên reş li ser sewkiya mal şer dikin, herdu li ser dûv sekinîne ez çi bikim alîkariyê ji kê bixwezim..? Dapîra min kêlek dabû sobê xwe çeliqand û got: Heh...!!! Matmayîneke tev hevîrê tirsê hatî stiran ez dorpêç kirim û mîna tavek BUHARê min xwe ajot rodankê ku şêr bibînim lê dayîka min ez vegerandim dîsa deng bi dapîrê ket : - MELÊ porê xwe di devê ke da ku mar nerevin û bang li cîranan bike bila werin van mêratina bikujin. Û her weha dayîka min dest avêt pêlikê û rahişte devê xwe bang li cîranan kir. Ta wî ciwan mêrî serê herdu maran pelixand, dapîrê careke din gopalê xwe hejand got: _ Ew her du li ser mêroka şîn şer dikin, yekê gewriya yê din biqopirîne da ku morîkê jê bistîne. Weha digot û bejna gopêl bi hêminî dipeland.. Piştî sarbûna şêr, dayîka min her du tekên rodankê dan hev. Tenê ew şev bê çîrok di qulikên tenêtiyê de bi qurequra beqan û gewtiniya segan re li benda navikbirîna riya kadizê li çolberan bi dîlana mişextiyê fireh digerandin.

Piştî tewika bafûnî ji xwerina avsîrê û pariyên nanê hûr me vala kir, dest bi rêxistina nivînan bû. Di bin mitêla tirsê de, liplipa zimanê çirê saw sawîrên çiyayê KURMÊNC di seriyê min yê bi temenê pênc saliyê hêgin kir. Teşiya evsaniyan ez li govdeyê xwe gerandim. Û mereqa dìtina morîka şîn ez hêrandim, firîşteyên xewnan lingên min sist kirin, kirasekî sipî li xewna min kirin, mêrok di pençа min de veşartin û di qebaqên tariyê de li qeyêkên kaxezî sîrwar kirim, ta îro jî hîn ez û wê xewnê li benda şifaqê ne û ji xew şiyar nebûne.

# Çiyayê Hawarê

**Rozad Elî**

Çiyayê Hawarê ji çiyayên Efrînê yê navdartir e. Çiyakî bi darûpber û pir qors[Asê] e. Rengereng, dar, geya, lawir û tilûr di nava riş, newal, sirt û darûberên wê de dijîn. Li çend salên dawîn dewletê ew mîna “xwezayeke parastî” destnîşan kiribû. Çiyayê Hawarê di navenda navça Çiyayê Kurmênc-Efrînê de ye. Loma jî ew bûye mîna sembolekê ji navçê û ji şêniyê wê re, û bi sedan zarok bi (Hawar) hatine binavkirin. Ango ew bûye wek şaneke hebûn, ciwanî, serbilindî û pêdariya xelkê me yê Kurd li navçê.

Çi.Hawarê ji rojihlat de berve Rojava berdirêj dibe, û xwe piçekî bi Başûr de badide.Dirêjiya wî dora 10/km ye, pehnahî jî di navbera 3 û 4/km de ye. Serê wî yê herî bilind (961/m) li ber Gu.Çiyê ye.

Sînorên Çi.Hawarê wiha ne:

Li **Rojhilat**: Geliyê 'Eşûnê di Rojavaya Gu.Qirigolê û Ĥsendêra re dere. Li hember Gu.Ĥesendêra di pesarê Çi.Hawarê de, kaviline şûnewarî hene, Şikefteke bi navê “Şikefta Bûkê” li wir e, ew şikefteke fereh û mezin e, navê xwe ji wêneyê jinekê ku li ser zinarekî li kêleka wê hatiye nikrandin, biriye. Di navbera wan …..

11

## Xalidê … Dûmahîk

li Şamê rûdine û bi zanyarên olî yên şamî re dimîne, mîna Şêx Ebdela Kizberî û bilî wî jî.

Piştî ku ji Hecê vedigere, di riya Tehran û Hemedanê re diçe Hindistanê, ta sala 1808an lê dimîne û zanînên rêola ku Behadînê Belxî danîbê fêr dibû, piştre vedigere Kurdistanê, lê paşê jî diçe li Şamê rûdine, û li sala 1826an diçe ber dilovaniya Xwedê.

Şêx Xalid rêola Neqişbendî li deverên fereh ji Rojhilata Navîn belav kir. Gelek zaniyar û bawermend li ser destên wî bûn têkildarê wê rêolê, bi taybetî jî ji Kurdan. Ji zanyarên Kurd ên naskirî, ku di heyameke Neqişbedî de rabûne, Mele Remedanê Botî û Kurê wî Mihemed Se'îd, Miftiyê Sûryê Şêx Ehmedê Keftaro û Şêx Husên Kurka ji navça Çiyayê Kurmênc-Efrîn.

Hin rêberên Neqişbendî yên Kurd li sedsala bîstan, serkêşiya şoreş û serhildanên Kurdan li hember zulma dewletan kirine, wek Şêx Se'îdê Pîran li sala 1925an li Tirkiyê, û her sê bira Ebdiselam, Ehmed û Mistefa Barzanî li Kurdistana Êraqê.

Ev in hin rawestegeh û guherînên giring di jiyana xudanê rêola neqişbendî de:

Şêx Xalid li Kurdistanê û li derve jî pir navdar û deng dabû, û bi çend navan dihat nasîn, jê: Dubaskî – Bexdadî- Şehrezorî – Kurdî…

Bi dehan pirtûk û dahênên wî bi Erebî û farisî hene, dîwaneke wî ya helbestê bi zimanê kurdî û farisî jî heye, ev in çend malik jê:

Ne berrî yem, ne behrî yem
Ne şerqî yem, ne xerbî yem
Ne ez erkanê teb`î yem
Ne ez eflakê gerdan im
Ne ez Çîn im, ne ez Hind im
Ne Bulxar û ne Maçîn im
Ne ez milkê Îraqê me
Ne ez Xakê Xurustan im
Ne ez av im, ne ez ba me
Ne ez xak im, ne ez ateş
Ne ez dinya, ne ez Uqba
Ne ez Fîrdewsê Ridwan im

*Ji rûpelên Fêsbûkê ..*
*Amadekar:R.Elî*

## Hevpeyvî ... Dûmahîk

nebin piştgirên wê û li kêleka wê nesekinin, digel em wek partî jî ne beşek in ji wê.

***-Win wek partî, guman li we dibe ku win di bin şora Rêvebiriya Xweseriyê de ne, digel ku win wek hevbendî jî dibêjin win li derveyî çarçewa Encûmena Niştimanî ya Kurdî û Tevgera Civaka Demokrat in?***

Em wek Partiya Yekîtî, ji partî û çalakvaniyên civakî yên ku Hevbendiya Niştimanî Kurdî damezrandine ye. Em ji ser zemîneke Sûrî de bi pirs û kesên din re didin û distînin. Li ber çavên me ye ku em aştiya şêniyane biparêzin û nakokî û pilokan ko bikin, daku keda hemiyan ji bo têkbirina armancên DAIŞ û Nusra bibe yek. Em kar dikin jî ku lêvegerek siyasî ya kurdî bê darijtin û guh nedin gotegotên toreyên ragihandinê û alavên navgîniya civakî.

***-Sozê lidarxistina kongira Encûmena Niştimanî ya Kurdî nêzîk dibe, tu hewildan hene ku win vegerin nava rêzên wê?.... wergerandin ji Erebî: M.Elî***

Em çi di Partiya Yekîtî û çi di Hevbendiyê de, em di ber encamên ustubarî û siyasetên ENKS de ku hîn di bin konê Itîlavê û gotar û kabikavêtina wê de ye, ne berpirs in. Bi taybet rêvebirina ENKES û şorên sebaret gotinên li ser girêdana kongirê wê tên kirin, ew li radeya yekê bi raser, û li asta duyem jî bi alîgirên wê li hundirê Sûryê ve girêdayî ye. Di vê babetê de, me tu vexwendin ji aliyê ku mijara vexwendinê di destan de ye, negirtiye.

## Çiyayê ... Dûmahîk

her du gundan de, "Pîrozgeha Midewer" heye, ew jî komek e ji darên sindîganê.

Li aliyê Başûr: Em kanin ji Rojhilat de berve Rojava van dîmenên sereke bibînin: Ge.Kerîm li hember Gu.Şorbe ye. Pişt re şûnewarên Keloşka Hawarê hene, ew li ser serê çiyê li Başûrê Gu.Çiyê bi nêzîkî 1.5/km ye. Serê ku li Rojavaya Keloşkê ye jî bi navê Pozê Mişmişê tê nasîn, û bilindiya wî 906/m e.

Li Rojhilata Gu.Avrazê, bi dehan şikeft li binê pesarên çiyê hene, hin ji wan bi destan hatine kolan, şêniyê gundên derdorê lê dibin xudî, û berê şêniyê Gu.Avrazê ew bi kirê didan malên ku bizin xudî dikirin, nemaze şêniyê navça 'Ezazê.

Li Rojavaya Gu.Avrazê, geliyekî kûr bi navê Ge.Gerê heye, ew ji dorhêla Gu.Şêx, ji serê çiyê de dest pê dibe, û bi ser Gu.Gobekê de dadikeve, li nîvê wî gelî, geliyê bi navê Qertel tê ser, li dawiya wî jî geliyekî bi navê Ge.Heftêr tê ser.

Li hêla Çi.Hawarê yê Başûr, û ji aliyê Rojhilat de berve Rojava, ev gund hene: Xirabî Rûtê li hember Gu.'Emara, Avraz, Gobek û Sêwiya li ser bêleke bilind e, û bi ser deşta Kitixê de xûz dibe.

Li ber Gu.Sêwiya jî cihekî bi navê Deve Bonê heye, pîrozgeha Ĥec Yûsif û mezelê gund li ser in. Di nav wî mezelî de gorine kevin ji dora du sed sal de hene. Cihekî şûnewarî bi navê Kêlbêz jî li Bakurî wî gundî heye, li kêleka wî cihî, benek mezin bi navê Bena Tecêl jî heye.

Pesarê Rojava ji Çi.Hawarê: Ew pesarine bi darûber in, û bi şêweyekî pir dîke dadikevin ser Ge.Tîra, pozê çiyê li wir bi Ustukurê bi nav dibe, û bilindiya wî digihê 735/m. Ev gund li aliyê çiyê yê rojva, li ser çiyê û li ser pesarên wî hene: Gu.Şêx, Şêxbila, Goliyê Jorin û Jêrin û Berbenê.

Li aliyê Bakur: Dîsa çiya qors û bi darûber e, geliyekî kûr bi navê Ge.Qî ji ber Gu.Çiyê, di rûyê Çi.Hawarê yê Bakur re dadikeve, û li paş bendava 'Eşûnê digihê geliyê Zivingê.

Çend cihên ku şênî wan pîroz dibînin jî li ser Çi.Hawarê hene, ew bi navê Suĥbe tên nasîn, wek: Suĥbe Elpî, Suĥbe Paçik û Suĥbe Dozelek.

# Şîfa Gerdî Xan.. Şehîda Kurdistanê

Roja 25/2/2017, di encama teqîna mayînekê de li bajarê Mûsilê, rojnemavan zîrek û rêvebira beşê amadekirina nûçeyan di kenala Rûdawê de xanim Şîfa Gerdî jiyana xwe ji dest da û derbas nav rêza nemiran bû. Bi wê boneyê, nivîsgeha ragihandinê ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûryê li Herêma Kurdistanê birûskeke sersaxiyê hinart, tê de serê malbata nemir Şêfa Xan, karmendên kenala Rûdawê û hemî gelê Kurd xweş kir, û çakbûn ji wênegirê birîndar Yûnis Mistefa re hêvî kir. Em jî bi navê weşana Newrozê, karmend û nivîskarên wê, xemgîniya xwe derbara şehîdbûna hevkara me Şîfa Gerdî derdibirin, û ji heval, malbat û hemî lawên gelê Kurd re hedar û serxweşiya hêvî dikin.

**Bimre DAIŞ .....**

**Bimre terror ......**

**Bimiçiqa kaniya wan .....**



# Mîra Nemir Tirko Xan Temenê Xwe Kir

Li roja 21/2/ 2017an, jina Kurd a navdar Tirko Feqîr Cindî temenê xwe kir û çû ser qedera xwe. Dadê Tirko Xan kebaniya Tehsîn Begê kurê Se`îd Begê Mîrê Êzdiyan e. Tirko Xan xwedî kesayetiyeke xurt û mêrankî bû. Di hemî deman de, şahî, tengî û dûrkirinê de li kêleka Mîr Tehsîn bû û barê civaka xwe hildigirt. Eger pêwîstî çêdibû, ew li şûna Mîr rûdinişt, pirs û pirsgirêkên xelkê dişopandin û çareser dikirin. Ew jineke camêr bû, bi destê xelkê xwe digirt, xatirê kesî nedişkand û kesek destvala venedigerand. Mîrxan Dadê Tirko wêrek, nazdar û xwedî kesatiyeke bi rûmet bû.

Em bi navê desteya sernivîser a weşana Newrozê, nivîskar û xwendevanê wê, serê Mîr Tehsîn, malbata wî û hemî gelê Kurd xweş dikin.



**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com